



RAPORA ÇALAKIYAN 2024-2026

KOMÎSYONA ZIMANÊ KURDÎ
YA BAROYA WANÊ

Mijdar 2024 - Îlon 2026



RAPORA ÇALAKIYAN 2024-2026

NAVEROK

● KOMÎSYONA ZIMANÊ KURDÎ

Civîn, rêxistinbûn û serlêdanên fermî

● XEBATÊN PERWERDEYÊ

Dersa bijarte ya Kurdî û Qursa Zimanê Kurdî

● HEVKARIYA NAVBERA SAZIYAN

Seredan, bernameyên hevpar û civînên torê

● DAXUYANIYÊN ÇAPEMENIYÊ

Parastina mafên zimanî û serlêdanên hiqûqî

● ÇALAKIYÊN 21Ê SIBATÊ Û 15Ê GULANÊ

Roja Zimanê Dayîkê û Roja Zimanê Kurdî

● BERNAMEYÊN ÇAND Û HUNERÊ

Fîlm, belgefîlm, şano, mûzîk û gotûbêjên wêjeyî

● XEBATA FERHENG A TERMÊN HIQÛQÎ

Komxebata termên hiqûqî yên Kurdî

● BÎRANÎN Û ROJÊN TAYBET

Bîbiranîna zimanzan, nivîskar û rojnamegerên Kurd



KOMÎSYONA ZIMANÊ KURDÎ

Civîn, rêxistinbûn û serlêdanên fermî

TORA KOMÎSYONÊN ZIMANÊ KURDÎ YÊN BAROYÊN HERÊMÊ

JI ÇAPEMENÎ Û RAYA GIŞTÎ RE

Vê dawiyê li Batman, Mêrdîn û qezaya Xelfetiyê ya Rihayê bi awayekî neheq û nehiqûqî qeyûm hatin tayinkirin. Kesên li şûna şaredarên meşrû yê hîlbijartî hatin danîn, qeymeqam an waliyê ne ku tayinkirina wan jî neheq e.

Berî sê mehan me li ser rakirina nivîsên kurdî yê "Pêşî Peya" û "Hêdî" daxuyani dabû ku me vê yekê wek êrîşeke li zimanê kurdî ragihandibû. Vê carê jî em dibînin ku qeyûmê tayinkirî yê Batmanê **xeberên bi kurdî jî ser malpera şaredariyê rakirîye**. Qeyûmê li şûna şaredarê Xelfetiyê tayinkirî jî ji ser hesabê medyaya civakî ya şaredariyê **nivîsên kurdî** (yên wek "Şaredariya Xelfetiyê" û "Hesabê fermî yê Şaredariya Xelfetiyê ya X'ê") **rakirîye**.

Di sa van rojên dawiyê **gelek konserên hunermendên kurd** ên meşhûr Rojda (Şaredariya qezaya Kuçukçekmeceyê ya Stenbolê), Diljen Ronî (Şaredariya Şişliyê ya Stenbolê), Azad Bedran (Şaredariya Murat Paşayê ya Antalyayê) û Xecê (3 konserên wê yê li Erzirom, Agirî û Mûşê) jî bi sedemên nemaqûl **hatin betalkirin**. Ev yek êrîşeke eşkere yê li hember zimanê kurdî nişan dide.

10.11.2024

Daxuyaniya hevpar a Tora Komîsyonên Zimanê Kurdî yê Baroyên Herêmê ji çapemenî û raya giştî re hat pêşkêşkirin. Di daxuyaniyê de mafên zimanî û pêwîstiya perwerdehiya bi zimanê dayîkê hatin bibîrxistin.

Praktîkên sistematîk ên rayedarên dewletê yê li dijî zimanê kurdî endîşedêr e. Bêtemhemiliya neheq ya li hember zimanê kurdî nayê qebûlkin. Her çî qas li Tirkîyeyê zimanê kurdî jî xeynî bikaranîna di zimanê fermî de û li saziyên giştî wek teorîk nehatibe astengkirin jî, em dibînin ku bi biryarên derhiqûqî fiilen astengî li ber bikaranîna zimanê kurdî tên derxistin.

Em wek Tora Komîsyonên Zimanê Kurdî yê Baroyên Herêmê giringiya kultura plurîzmê cardin bi bîr dixin û bang li rayedaran dikin ku hurmetê li zimanê kurdî bigirin û ji bo rakirina astengiyên nehiqûqî yê li ber zimanê kurdî û zimanên din xebatên qanûnî yê hewce pêk bînin.

1. KOMÎSYONA ZIMANÊ KURDÎ YA BAROYA AGIRIYÊ
2. KOMÎSYONA ZIMANÊ KURDÎ YA BAROYA AMEDÊ
3. KOMÎSYONA ZIMANÊ KURDÎ YA BAROYA BATMANÊ
4. KOMÎSYONA MAFÊN ÇANDÎ Û ZIMANÎ YA BAROYA MÊRDÎNÊ
5. KOMÎSYONA ZIMAN YA BAROYA RIHAYÊ
6. KOMÎSYONA ZIMANÊ KURDÎ YA BAROYA ŞIRNEXÊ
7. KOMÎSYONA ZIMANÊ KURDÎ YA BAROYA WANÊ

10.11.2024

11.2024

Me wek Komîsyona Zimanê Kurdî ya Baroya Wanê civîna xwe li dar xist. Di civînê de plansaziya xebatên dewrê hat kirin. Di civînê de pêkhatiya komîsyonê, dabeşkirina peywaran û rêbaza xebatê hat diyarkirin.





22.11.2024

Komcivîna 4em a Tora Komîsyonên Zimanê Kurdî yên Baroyên Herême bi mazûvaniya Baroya Mêrdînê pêk hat. Di civînê de xebatên hiqûqî yên li ser zimanê Kurdî hatin nirxandin.

27.09.2025

Civîna komîsyonê ya dewreyî pêk hat; bernameyên payizê û xebatên perwerdehiyê hatin plankirin. Herwiha xebatên pêşerojê yên li ser ferhenga termên hiqûqî û bernameyên çandî hatin nirxandin.



16.05.2026

Me wekî Baroya Wanê ji bo lêkolîn, parastin, arşîvkirin û piştgiriya sazûmanî ya ziman, dîrok û çanda Kurdî, bi awayekî fermî serlêdana damezrandina «Saziya Ziman, Dîrok û Çanda Kurdî» ji Wezareta Çand û Turîzmê re kir.

XEBATÊN PERWERDEYÊ

Dersa bijarte ya Kurdî û Qursa Zimanê Kurdî



DERSA KURDÎ HILBIJÊRE!

Divê her xwendekar bi vîna xwe, bê astengî û
destwerdanan bikaribe dersa kurdî hilbijêre!

Komîsyona Zimanê Kurdî Ya
Baroya Wanê



DAXUYANÎYA ÇAPEMENÎYÊ
Dirok : 10ê Sibata 2025 Ê, DUŞEMÊ
Saet : 12:30
Cih : Dadgeha Wanê



KÛTRÇE DERSINI SEÇ!

Her öğrenci özgür iradesiyle ve hiçbir müdahale olmadan
Kürtçe dersini seçebilmeli

Van Barosu
Kürtçe Dil Komisyonu



BASIN AÇIKLAMASI
Tarih : 10 Şubat 2025 PAZARTESİ
Saat : 12:30
Yer : Van Adalet Sarayı - İpekyolu/VAN

07.02.2025

Di çarçoveya kampanyaya hilbijartina dersa Kurdî de bang li malbat û xwendekaran hat kirin: «Divê her xwendekar bi vîna xwe, bê astengî û destwerdan bikaribe dersa Kurdî hilbijêre.»

JI QATÊ MEHTÊ ÇARÇOVEYÊ

Wek ku tê zanîn navbera 3 - 17ê Sibatê 2025ê li dibistanan dema hîlbijartina dersên kurdî yê biarte ne. Em vê daxuyaniya çapemeniyê ji bo ku her xwendevan bê astengî û destwerdanan bikaribe dersa kurdî hîlbijêre didin!

Helbet dersa biarte ya zimanê dayîkê nikare şûna perwerdeya bi zimanê dayîkê bigire û bînpêkirinê mafê perwerdeya bi zimanê dayîkê ji holê ranake. Lê em bi xemgînî radigihînin ku ev dersên biarte yê Kurdî jî nahêlin bê hîlbijartin, ger werin hîlbijartin jî nayên şopandin.

Qanûna bi hejmara 43 ya di 24ê Tebaxa 2023an de hatiye nûkirin, xwendekarên ku dersa Kurdî hîlbijêrin, ji hîlbijartina dersên zanistî yê wekî 'Matematik' hatine astengkirin. Ev tê wê wateyê ku zarokên ku dixwazin bi zimanê xwe yê dayîkê hîlbijêrin, ji dersên zanistî bêpar dimînin. Ev pratîka ku bi pêwîstiya wekheviyê û pêşkeftina akademîk ku di nav prensîbên bingeîn ên perwerdehiyê de ne, divê demildest bê sererastkirin.

Gelek lêkolînên zanistî nîşan didin ku perwerdeya bi zimanê dayîkê bandoreke erênî li pêşkeftina zarokan dike. Divê bê zanîn ku perwerdebûna bi zimanê dayîkê him warê mafên mirovan him jî zanistî û hiqûqî pêwistîyeke girîng e.

Tê ditin ku dersên biarte yê zimanê dayîkê ji ber helwestên keyfî yê rêveberên perwerdehiya bajar û dibistanan gelek caran tînin astengkirin û pratîkê de zehmettir dîkin. Bi hinceta "mamoste tune" û bê malbata xwendekara tijîkirina forma hîlbijartinê, destwerdanek hîlbijartina zimanê dayîkê ye û ev tişt nayê qebûlkirin! Her wiha bi awayekî objektîf şopandina dersa zimanê dayîkê pêwistîyeke qanûnî ye.


Em dixwazin bidin zanîn ku ji bo gilişkirina perpirsaran malbatên ku ji van kiryarên derqanûnî aciz bûne em ê alîkariyên hiqûqî bidin wan. Malbat dikarin bi serlêdanek nivîskî an jî dikarin bi dagirtina forma ku li ser înternetê hatiye amadekirin ji komîsyona me daxwaza alîkariya hiqûqî bikin. Mafê perwerdehiya bi zimanê dayîkê mafekî bingeîn e ku di çarçoveya peymanên navneteweyî û pîvanên mafên mirovan ên gerdûnî de hatiye naskirin.

Em bang li tevahî raya giştî û rayedaran dîkin; rêzgirtina li vîna zarokan a hîlbijartina zimanê dayîkê erkeqanûnî ye û serlêdana dêûbavan derheqê van kiryarên kêfî û derqanûnî de em amadene ku her cure alîkariya hiqûqî bidin.



10.02.2025

Me wekî Komîsyona Zimanê Kurdî ya Baroya Wanê û Lijneya Ziman, Çand û Hunerê ya Komeleya Hiqûqnasên Ji Bo Azadiyê, bi hev re derheqê dersa biarte ya Kurdî de daxuyaniyek çapemeniyê da.



17.02.2025

Bi hevkarîya Tora Komîsyonên Zimanê Kurdî yê Baroyan bangewaziya «Em Kurdî hilbijêrin» hat belavkirin; roja dawî ya hilbijartina dersan 17ê Sibatê bû.



06.10.2025

Qeydkirina Qursa Zimanê Kurdî dest pê kir. Hevkarên ku dixwestin beşdar bibin heta 10ê Cotmehê navên xwe dan nivîsandin. Qurs ji bo parêzer û hevkarên ku dixwazin zimanê Kurdî hîn bibin an pêş bixin hat organîzekirin.





30.10.2025

Qursa Zimanê Kurdî bi beşdariya parêzer û hevkarên berdewam kir; ders li Baroya Wanê hatin dayîn. Armanca qursê ew e ku parêzer karibin di dosya û danûstandinên xwe de bi Kurdî bixebitin.

14.02.2026

Ji bo sala perwerdehiyê ya nû bangewaziya «Dersa Kurdî hîlbijêre!» ji nû ve hat belavkirin. Bang li malbatan hat kirin ku bêtî tirs û astengî dersa Kurdî hîlbijêrin; komîsyona me diyar kir ku li hember her astengkirinê dê alîkariya hiqûqî bide.

DERSA KURDÎ HILBIJÊRE!

Divê her xwendekar bi vîna xwe, bê astengî û destwerdanan bikaribe dersa kurdî hîlbijêre!

Komîsyona Zimanê Kurdî Ya Baroya Wanê

KÜTRÇE DERSİNİ SEÇ!

Her öğrenci özgür iradesiyle ve hiçbir müdahale olmadan Kürtçe dersini seçebilmeli

Van Barosu
Kürtçe Dil Komisyonu

HEVKARIYA NAVBERA SAZIYAN

Seredan, bernameyên hevpar û civînên torê



07.12.2024

Me wek Komîsyona Zimanê Kurdî ya Baroya Wanê pêşwaziya Komeleya Navenda Lêkolînên Ziman, Çand û Hunerê ya KURDÎGEH kir. Me bi hev re li ser xebatên xwe nirxandinên sûdwer kirin.

05.01.2025

Bernameya me ya ku bi hevkarîya Eğitim Sen a Şaxa Wanê hatibû amadekirin bi kêf û coş qediya. Em ji mêvanê xwe yê qedirbilind Îhsan Colemêrgî û beşdarên xwe re spas dikin.





03.05.2025

Civîna Tora Komîsyonên Zimanê Kurdî yên Baroyên Herêmê li Sêrtê pêk hat. Li ser navê komîsyona me Prz. Kadir KUTEVÎ tevî civînê bû.



02.04.2026

Em beşdarî vekirina Komeleya Nivîskar û Wêjekarên Kurd ên Serhedê (KurdîWar) bûn. Em bawer dikin ku xebata di warê ziman û wêjeyê de dê bandorên girîng li hilberîna ziman û çandê bike.

KurdîWar

Em ê bi beşdarbûna we ya vekirina komeleya me

KURDÎWARÊ

bextewar û şanaz bibin.





14.05.2026

Di şahiya 15ê Gulanê de em bi dirûşmeya «Statuya Kurdî, Perwerdehiya bi Kurdî» tevî Bernameyên Konên Ziman ên Kurdîgehê bûn.

DAXUYANIYÊN ÇAPEMENIYÊ

Parastina mafên zimanê û serîlêdanên hiqûqî

JI ÇAPEMENIYÊ Û RAYA GIŞTÎ RE



Me weke Komîsyona Zimanê Kurdî ya Baroya Wanê, der barê rêveberên SZC TV û xebatkarê wê Serap Belovacikli de ji ber sansura Kurdî gîlî li Serdozgeriya Stenbolê kir.

Di bernameyeke nûçeyan a ku di 27ê Sibata 2025an de li SZC TV hat weşandin de, dema Ahmet Turk dest bi axaftina bi kurdî kir, weşan hat qutkirin û hat gotin ku "Em daxuyaniyê bi kurdî naweşînin."

Sansûrkirina zimanekî di medyaya giştî de eşkere cudakarî, nijadperestî û sûcê nefretê ye. (TCK 122, 216)

Axaftina bi zimanê dayîkê mafê herî bingeîn ê mirovan e û li dijî bînpêkirina vî mafî em ê têkoşîna xwe ya hiqûqî bidomînin.

Em bi rêzdarî bang li hemû raya giştî dikin ku mafên xwe yê ziman biparêzin û li dijî pêkanînen cudakar û nijadperest ên li ser Kurdî bertek nîşan bidin.

KOMÎSYONA ZIMANÊ KURDÎ YA BAROYA WANÊ



03.03.2025

Me wekî Komîsyona Zimanê Kurdî ya Baroya Wanê, derheqê weşana cihêkar a li ser kanala SZC TVyê de ji Serdozgeriya Komara Stenbolê re doza sizayê vekir.

BASINA VE KAMUOYUNA



Van Barosu Kürtçe Dil Komisyonu olarak, SZC TV yetkilileri ve haber spikeri Serap Belovacikli hakkında İstanbul Cumhuriyet Başsavcılığı'na suç duyurusunda bulunduk. 27 Şubat 2025'te SZC TV'de yayımlanan bir haber programında, Ahmet Türk'ün Kürtçe konuşmaya başlamasıyla birlikte yayının kesilmesi ve "Kürtçe açıklamayı yayına vermiyoruz." ifadelerinin kullanılması, açık bir ayrımcılık ve nefret suçu teşkil etmektedir.

Bir televizyon kanalının yalnızca Kürtçe'yi hedef alarak yayını kesmesi, Kürtçe konuşan milyonlarca insanı yok sayan, dışlayan ve ötekileştiren bilinçli bir tutumdur.

Bizler, Kürtçe Dil Komisyonu olarak, anadilinde konuşmanın en temel insan hakkı olduğunu bir kez daha vurguluyoruz. Kürtçe'nin kamu alanında kullanımı bir lütuf değil, hukuki ve insani bir haktır. Bu tür yasakçı ve ayrımcı uygulamalara karşı hukuki mücadelemizi sonuna kadar sürdüreceğiz.

Yetkilileri, medya kuruluşlarını ve tüm kamuoyunu, dil haklarına saygılı olmaya ve ayrımcı uygulamalara karşı tepki göstermeye davet ediyoruz.

VAN BAROSU KÜRTÇE DİL KOMİSYONU



06.03.2025

Bi sernavê «Daxwaza me bidawîanîna zextên li ser zimanê Kurdî ye» daxuyaniyek ji raya giştî re hat dayîn. Di daxuyaniyê de hat xwestin ku zextên li ser karanîna zimanê Kurdî bidawî bibin û mafê perwerdehiya bi zimanê dayîkê bê misogerkin.

DAXWAZA ME BIDAWÎANÎNA ZEXTÊN LI SER ZIMANÊ KURDÎ YE

Em hîn bûn ku îro danê sibehê, zimannasê kurd **Samî Tan** li Rihayê, **Mevlüt Aykoç** li Stenbolê û **Ronayî Onen** li Diyarbekirê hatine desteserkin. Bi hinceta derxistina hinkereka zimanê kurdî, polis serê sibehê bi ser mala her sê daneran da girtine û ew desteser kirine.

Kesên bi vî operasyonê girtî kesên sivil in û bi karê zimanê kurdî ve eleqedar in, nasnameya wan a zimannasiyê li pêş e. Operasyonên li hember aktivîst, nivîskar û zimannasên kurdî, zimanê kurdî wek zimanekî krîmînal nîşan dide. Serdegirtin û girtina van kesan û li ser navê wan operasyonêke li hember aktivîzma zimanê kurdî ye. Ev yek herwiha bi **krîmînalîkirina zimanê kurdî**, dibe sedema dîrxistina gelê me ji xebatên zimanê kurdî.

Li Tirkîyê herçiqas zimanê kurdî ji xeynî bikaranîna di zimanê fermî de û li saziyên giştî wek teorîk nehatibe astengkirin jî, em dibînin ku bi biryarên derhiqûqî filen astengî li ber bikaranîna zimanê kurdî tên danîn. Her wekî vî hin kiryarên dezgehên dewletê rê didin dîrbûna ji xebatên zimanê kurdî.

Em bi bir dixin ku karên eleqedarê zimanê kurdî li gor qanûnan ti sîcekî teşkil nakin. Di her qadê de ji yîn û parastina vî zimani mafê her kurdekî ye. Em ê vî mafê li her derê biparêzin. Bi rêya darazê tevî hînbûn an hinkirina zimanê kurdî sedembûna tehdeya li ser karên zimani yên kurdî nehiqûqî ye.

Em wek **Tora Komisyonên Zimanê Kurdî yên Baroyên Herêmê** bi birxistina girîngiya kultura plurîzmê **bang li rayedaran dikin ku girtina nivîskarên kurd û serdegirtinên li malên wan nehiqûqî ye** û divê nivîskarên zimanê kurdî demildest bînin berdan.

1. KOMÎSYONA ZIMANÊ KURDÎ YA BAROYA AGIRIYÊ
2. KOMÎSYONA ZIMANÊ KURDÎ YA BAROYA AMEDÊ
3. KOMÎSYONA ZIMANÊ KURDÎ YA BAROYA BATMANÊ
4. KOMÎSYONA MAFÊN ÇANDÎ Û ZIMANÎ YA BAROYA MÊRDÎNÊ
5. KOMÎSYONA ZIMAN YA BAROYA RIHAYÊ
6. KOMÎSYONA ZIMAN YA BAROYA SÊRTÊ
7. KOMÎSYONA ZIMANÊ KURDÎ YA BAROYA ŞIRNEXÊ
8. KOMÎSYONA ZIMANÊ KURDÎ YA BAROYA WANÊ

JI ÇAPEMENIYÊ Û RAYA GIŞTÎ RE

Em wekî Komîsyona Zimanê Kurdî ya Baroya Wanê, ji ber xemsariya rêvebirên dibistanan û astengiyên ku li pêşiya hîlbijartina darsa hijarte ya Kurdî derxistine, li dijî wan pêvajoya hiqûqî didine destpêkirin.

Em bi rêzdarî ji raya giştî re radigihînin ku em dê bi rêya vî giliya ku li serdozgeriya giştî hatiye qeydkirin, ji bo bicihkirina prensîba bersivdêriyê û sizadana xemser û berpirsyarên wan astengyan, heya dawiyê wê pêvajoya hiqûqî bişopînin.

KOMÎSYONA ZIMANÊ KURDÎ YA BAROYA WANÊ



BASINA VE KAMUUYUNA

Van Barosu Kürtçe Dil Komisyonu olarak bazı okul idarelerinin seçmeli Kürtçe derslerine yönelik keyfî engellemeleri ve ihmalleri nedeniyle hukukî süreç başlatmış bulunmaktayız.

Cumhuriyet Başsavcılığı'na yaptığımız suç duyurusu ile sorumluların yargı önünde hesap vermesi için gerekli adımları attığımızı kamuoyuna saygıyla duyururuz.

VAN BAROSU KÜRTÇE DİL KOMİSYONU



13.03.2025

Li hember astengkirina keyfî ya dersên bijarte yên Kurdî ji aliyê hin rêveberiyên dibistanan ve, me daxuyanî da û ji Serdozgeriya Komarê re doza sizayê vekir.

03.08.2025

Li ser bînpêkirinên mafên zimani daxuyaniyek ji çapemeniyê û raya giştî re hat pêşkêşkirin. Em bang li saziyên fermî kirin ku astengiyên li pêş karanîna zimanê Kurdî bînin rakirin.

JI ÇAPEMENIYÊ Û RAYA GIŞTÎ RE

Dijminatîya li dijî Perwerdeya Zimanê Kurdî ya Qeymeqamtîya Konak'ê em şermezar dikin. Li gor nivîsek fermî (25.07.2025 mawe 137176660 imar) ya Qeymeqamtîya Konak'ê derheqê "Komeleya Avesta ya Vekolînên Ziman û Çandê" biryara girtinê hatiye dayîn.

Sebebê girtina "Komeleya Avestayê" li bin seywana Komeleyê de perwerdeya Zimanê Kurdî hatiye nîşan dan. Qeymeqamtî ferman şandîye Şaredariya Konakê ku bi destê Zabîtayan deriyê Komeleyê bê mohr kirin û girtin.

Di sedsala 21an de ev biryar û ferman hişmendiyek nîjadî û paşverû ye. Sed sal berê bi rêya "Qanûna Tevhîd û Tedrîsat" ê dijminatîya li dijî zimanê kurdî îro bi ferman û biryarên Kargêrî tên meşandin. Em vî dijminatîya li dijî zimanê kurdî qebûl nakin, kî nî nefreta Karmend û bûrokratan ya li dijî zimanê Kurdî şermezar dikin.

Wekî Komîsyona Zimanê Kurdî ya Baroya Wanê em bi rêzdarî ji raya giştî re radigihînin ku divê derheqê Qeymeqamê Konakê prosesa lêpîrsînê bê destpê kirin û ti biryar û reftarên bi kî nî nefretê yê karmend û bûrokratan bê sîza neyê hiştin.

KOMÎSYONA ZIMANÊ KURDÎ YA BAROYA WANÊ



JI RAYA GIŞTÎ RE

Amedspor, ji aliyê Federasyona Futbolê ya Tirkîyeyê (TFF) ve, ji ber dirûşma Kurdî ya "Koma me bona we" hat sizadan. Pêşiyê de TFF'yê dirûşma li ser forma Amedsporê bi fermî pejirandibû.

Ev jî minakek aşkera ya bêtehamulîya sazî û dezgehên hikûmetê ye li hember zimanê kurdî ku zimanê bi dehan mîlyon kurdan e.

Ev zîhniyeta ku sazîyekê jî ber bikaranîna çend peyvên Kurdî sîza dide, ne tenê li dijî binemayên demokratîk û aştiya civakî ye, di heman demê da helwesteke dermîrovahî ye jî.

Bingeha vê sizayî bi tu awayekî hiqûqî nîne û keyfî ye. Çi normeke hiqûqî astengîya bikaranîna zimanê Kurdî rewa nake. Ev helwest nîjadperestîya rêveberên TFF'ê li hember kurdan nîşan dide.

Kî nû nefreta li dijî zimanê Kurdî bi destê sazî û dezgehên sporê berdewam dike.

Em vê kiryar û helwesta keyfî û nîjadperestane qebûl nakin. Berteka herî mezin xwedîderketina li zimanê Kurdî û bikaranîna wê di hemû qadên jîyanê da ye.

Em wekî Komîsyona Zimanê Kurdî ya Baroya Wanê wê biryarê bi tundî şermezar dikin û bang li saziyan dikin ku dilsozê binemayên hiqûq û wekhevîyê bibin.

KOMÎSYONA ZIMANÊ KURDÎ YA BAROYA WANÊ



27.09.2025

Ji raya giştî re daxuyaniyek li ser pêwîstiya naskirina statuya zimanê Kurdî hat weşandin. Hat diyarkirin ku bêtî naskirina fermî ya statuya zimanê Kurdî, mafên perwerdehî û karanîna ziman nayên misogerkirin.

10.10.2025

Em wekî Komîsyona Zimanê Kurdî ya Baroya Wanê, Komeleya Hiqûqnasên Ji Bo Azadiyê (OHD) û Komeleya Vekolîn û Perwerdeya Hiqûqê (DADSAZ) ji bo parastina mafên zimanî kom bûn û me di bin navê «Statuya Kurdî, Perwerdeya bi Kurdî» de daxuyaniyek çapemeniyê pêşkêş kir.



18.02.2026

Me wekî Komîsyona Zimanê Kurdî ya Baroya Wanê û Platforma Saziyên Demokratîk li ser 21ê Sibatê Roja Zimanê Dayîkê ya Cîhanê deklerasyonek da.

JI ÇAPEMENIYÊ Û RAYA GIŞTÎ RE

Em dijminatîya li dijî perwerdeya zimanê Kurdî ya ku ji hêla Gerinendetiya Perwerdeyê ya Bajêr ve pêk hatiye şermezar dikin.

Li navçeya Erdîşê ya Wanê, li ser saziya ARSÎSAyê ku perwerdeya zimanê Kurdî dide, ji aliyê Gerinendetiya Perwerdeyê ya Bajêr ve 400.050 TL sizayê kargêrî hatiye birîn. Ev reftare bînpêkirina aşkera ye mafê perwerdeya bi zimanê dayikê ye.

Fêrbûn û hînkirina zimanê dayikê mafekî bîngehîn e û astengkirina wî mafî bi rêya sizayên kargêrî nayê qebûlkin.

Mixabin di sedsala 21an de bi awayekî aşkera mafê perwerdehiya bi zimanê Kurdî tê bêkirin û ev yek li dijî prensîbên civaka demokratîk û pirrengiya çandî ye. Kiryarên bi wî rengî, li şûna aştîkirina civakê bînpêkirina mafan e û nişaneyê zêdetirbûna nijadperestiyê ye.

Em wekî Komîsyona Zimanê Kurdî ya Baroya Wanê bi rêzdarî ji raya giştî re radigihînin ku divê derheq Gerinendetiya Perwerdeyê ya Bajar ya Wanê prosesa lêpîrsînê bê destpêkirin, divê biryar û reftarên bi wî awayî ku li ser bîngeha kîn û nefretê pêk tên bîne bidawînin û pêkînerên wan kiryan werin sizadan.

KOMÎSYONA ZIMANÊ KURDÎ YA BAROYA WANÊ



30.03.2026

Li navçeya Erdîşê, li ser saziya ARSÎSAyê ku perwerdeya zimanê Kurdî dide, ji aliyê Gerinendetiya Perwerdeyê ya Bajêr ve sizayeke kargêrî hat birîn. Me ev reftar wekî bînpêkirina aşkera ya mafê perwerdeya bi zimanê dayikê şermezar kir.



02.04.2026

Li Erdîşê, em wekî Tora Ziman a Wanê beşdarî daxuyaniya çapemeniyê ya li Komeleya ARSÎSAyê bûn û sizaya kargêrî bi tundî şermezar kir.

15.05.2026

Me wek Komîsyona Zimanê Kurdî, Komeleya Hiqûqnasên Ji Bo Azadiyê ya Şaxa Wanê û Komeleya Vekolîn û Perwerdeya Hiqûqê li ber Baroya Wanê daxuyaniyek li ser 15ê Gulanê Roja Zimanê Kurdî da: «Bila Kurdî bibe zimanê fermî û zimanê perwerdeyê!»





JI RAYA GIŞTÎ RE

Li gorî nûçeyên ku di medyayê de belav bûne, kargeha bi navê **“Pirtûka Kurdî”** şaxa wê ya ku di bin banê Trendyolê de karê xwe dikir hatiye girtin; her wiha pirtûkên Kurdî û tiştên bi reng û dengê Kurdewariyê li ser platformê hatine rakirin.

Em geşedanên li ser vê babetê bi baldarî dişopînin. Ev yek li hemberî zimanê Kurdî û keda weşangeriya Kurdî neheqîyeke mezin e û bi ti awayî nayê qebûlîkirin.

Çavkanî û xebatên bi zimanê dayikê, mafê herî pîroz û bingeha çand û hebûna gelekî ye. Weşandina pirtûkan û gihîştina bi çanda xwe, mafekî siruştî ye ku nayê qedexekirin.

Em wekî Komîsyona Zimanê Kurdî ya Baroya Wanê, vê nêzikatîyê bi tundî şermezar dikin. Divê bê zanîn ku em ê li ser vê babetê rawestin, mafê zimanê kurdî biparêzin û bibin şopdarê vê meseleyê.



Komîsyona Zimanê Kurdî
ya Baroya Wanê

19.07.2026

Li ser girtina kargeha bi navê «Pirtûka Kurdî» û rakirina pirtûkên Kurdî ji platformê, me daxuyaniyek da û diyar kir ku em ê li ser vê babetê rawestin û bibin şopdarê meseleyê.

07.09.2026

Li navçeya Çerkezköyê ya Tekîrdaxê avahiya «Komeleya Vekolîn û Pêşxistina Ziman û Çandê ya Mezopotamyayê» hat gulebarankirin. Me ev êrîşa sistematîk şermezar kir û em ê bibin şopdarên tawanê.

JI RAYA GIŞTÎ RE

Li navçeya Çerkezkoyê ya bajarê Tekîrdaxê, avahiya ‘Komeleya Vekolîn û Pêşxistina Ziman û Çandê ya Mezopotamyayê’ hat gulebarankirin.

Em li ser navê Komîsyona Zimanê Kurdî ya Baroya Wanê van erîşên sistematîk yên li dijî zimanê kurdî bi tundî şermezar dikin.

Divê Serdozgerîya Çerkozkooyê bikerên vê erîşa nijadperest demildest tespît bike û derheqê gumanbaran de doza sizayî veke.

Em wekî Komîsyona Zimanê Kurdî ya Baroya Wanê, dê bibin şopdarên vê tawanê û dê li dijî tawankaran têbikoşin.



ÇALAKIYÊN 21Ê SIBATÊ Û 15Ê GULANÊ

Roja Zimanê Dayîkê û Roja Zimanê Kurdî

**21Ê SIBATÊ
ROJA ZIMANÊ DAYÎKÊ**

**GOTÛBÊJEK LI SER
"SERHILDANA 1925Ê"**


TAHSÎN SEVER
 NIVÎSKAR


KEREM SERHEDÎ
 NIVÎSKAR


**PRZ.
RÊZAN KEMALOGLU**
 PÊŞKÊŞVAN



Dîrok : 21 Sibatê, 2025
 Saet : 18:00
 Cih : Salona Konferansê ya Tahir Elçî / Baroya Wanê

17.02.2025

Ji bo pîrozbahiya 21ê Sibatê Roja Zimanê Dayîkê bernameya yekem hat ragihandin: gotûbêjek li ser «Serhildana 1925ê» bi beşdariya Tahsin Sever, Kerem Serhedî û Pr. Rêzan Kemaloglu.

22.02.2025

Me bernameya xwe bi kêf û coş qedand. Em ji mêvanên xwe yê qedirbilind û beşdarên xwe yê hêja re spas dikin. Di gotûbêjê de li ser Serhildana 1925ê, encamên wê yê civakî û bandora wê li ser zimanê Kurdî hat sekinandin.



**ŞAHÎYA 15Ê GULANÊ
YA ROJA ZIMANÊ KURDÎ**

**KURDÎ DI TERAZÎYA
LÎTERATÛRA HIQÛQÊ DA**



**PARÊZER
Sezgin DÎNÇ**
PANELÎST



**PARÊZER
Ebru DEMİRTEPE**
PÊŞKÊŞVAN



**HIQÛQNAS
Sabir EBDULAHÎZAD**
PANELÎST

Xebat û Hewildanên ji bo Xurtkirina
Lîteratûra Hiqûqê ya Kurdî

Lîteratûra Hiqûqê: Teyedan, Parastin,
û Pêxistina Dadmendiyê





DÎROK: 8ê Gulanê 2025
SAET: 18:00
CIH: Baroya Wanê

05.05.2025

Ji bo pîrozbahiya 15ê Gulanê Roja Zimanê Kurdî bernameya hevpar hat ragihandin: panela «Kurdî di terazîya lîteratûra hiqûqê da».

08.05.2025

Panel bi beşdariya mêvanên qedirbilind pêk hat û me bernameya xwe ya sûdwer bi kêf û coş qedand. Cihê zimanê Kurdî di lîteratûra hiqûqê de û pêwîstiya termên hiqûqî yên standard hatin gotûbêjkirin.



15Ê GULANÊ

ROJA CEJNA ZIMANÊ KURDÎ PÎROZ BE

DAXUYANÎ

CÎH: DADGEHA WANÊ

DEM: 20Ê GULANÊ

SAET: 12:00



20.05.2025

Li ber Dadgeha Wanê ji bo 15ê Gulanê Roja Cejna Zimanê Kurdî daxuyaniyek çapemeniyê hat dayîn. Hat bibîrxistin ku karanîna zimanê Kurdî li saziyên dadwerî mafekî bingehîn e.

09.02.2026

Ji bo pîrozbahiya 21ê Sibatê Roja Zimanê Dayîkê bernameya yekem a salê hat ragihandin: gotûbêjek li ser sînemaya Kurdî bi Dr. Sebahattin Şen û Prz. Muhammed Yariz.

ŞAHIYA ROJA ZIMANÊ DAYÎKÊ

**GOTÛBÊJEK LI SER
SÎNEMAYA KURDÎ**



DR. SEBAHATTIN ŞEN
AKADEMÎSYEN



PRZ. MUHAMMED YARIZ
PÊŞKÊŞVAN



Dem : 12 Sibatê, 2026

Saet : 18:00

Cih : Salona Konferansê ya Tahir Elçî / Baroya Wanê



12.02.2026

Me bernameya xwe ya yekem a bi navê «Sînemaya Kurdî» li dar xist. Em ji mêvanê xwe yê qedirbilind Dr. Sebahattin Şen û beşdarên xwe re spas dikin.



21.02.2026

«Zimanê me hebûna me ye!» Di 21ê Sibatê de em cardin dibêjin: parastin û pêşxistina zimanê Kurdî erka hemû kes, sazî û dezgehan e.

ZIMANÊ ME HEBÛNA ME YE!

Di 21ê Sibatê de ku wekî "Roja Zimanê Dayîkê yê Cîhanê" tê naskirin, em cardin dibêjin zimanê Kurdî rûmeta me ye û parastin û pêşxistina zimanê Kurdî erka hemû kes, sazî û dezgehan e.

Baroya Wanê dê hertim bi hêz û serfirazî mafên têkildarî zimanê Kurdî biparêze!

BAROYA WANÊ





PANEL

Bi boneya 21ê Sibatê “Roja Zimanê Dayîkê ya Navneteweyî”

PANELÎST



Pr. Ekrem KOÇBAŞI
HIQÛQNAS

PÊŞKÊŞVAN



Sabir EBDULAHÎZAD
VEKOLERÊ HIQÛQÊ

PANELÎST



Dr. Îbad ÎBRAHÎM
AKADEMÎSYEN

Ji hêla ZINDÎTÎYA ZIMANÎ VE REWŞA ZIMANÊ KURDÎ LI TIRKIYÊ: MAFÊN ZIMANÎ Û JÊ WÊDETIR

KURDÎ WEKÎ ZIMANÊ PERWERDEYA HIQÛQÊ Û ZIMANÊ DADGEHAN LI HERÊMA KURDISTANÊ: DERFET Û ZEHEMETÎ

Roj: 27ê Sibata 2026ê
Dem: 14:00
Cih: Eywana Tuhir Elçî - Baroya Wanê

27.02.2026

Panela bi boneya 21ê Sibatê bi beşdariya Pr. Ekrem Koçbaşî, Dr. Îbad Îbrahîm û hiqûqnas Sabîr Ebdulahîzad, bi hevkarîya DADSAZ û Komeleya Hiqûqnasên Ji Bo Azadiyê pêk hat.



15.05.2026

«Ziman ax e, war e, dîrok e, çand e, paşeroj û hebûna gelekî ye.» Bi boneya 15ê Gulanê Roja Zimanê Kurdî peyama pîrozbahiyê hat weşandin.

15Ê GULANÊ ROJA ZIMANÊ KURDÎ PÎROZ BE





Ziman ax e, war e, dîrok e, çand e paşeroj û hebûna gel e.
 Zimanê me hebûn û nasnameya me ye.
 Em dest ji doza hebûna xwe tu car bernadin.

KOMÎSYONA ZIMANÊ KURDÎ YA BAROYA WANÊ



BERNAMEYÊN ÇAND Û HUNERÊ

Fîlm, belgefîlm, şano, mûzîk û gotûbêjên wêjeyî



DİSTAN
director
ABDURRAHİM KARABULUT
MAHSUN CELAYİR

**KOMÎSYONA ZIMANÊ KURDÎ
BAROYA WANÊ**

**DERHÊNER
ABDURRAHİM KARABULUT**

**PÊŞANDANA KURTEFÎLM
Û
HEVPEYVÎN**

**13 MÎJDAR 2024
ÇARŞEM
SAET: 18:30**

**BAROYA WANÊ - SALONA
YILMAZ GÜNEY**

**TÊKİLÎ
PRZ. OZAN BAŞDİŇÇ
+90 541 328 02 62**

CAST: ZEYNEP KULOÇLU NAİR SUBAŞI ZARİFE KAZICI SUMEYYA ÇİRKİ ASIMAN ÇALASIN KAZIM BAYNAL SERDAL ANAŞIN ERKAN İLKAY HEDİYE
PRODUCER: ABDURRAHİM KARABULUT
DIRECTOR OF PHOTOGRAPHY: EDITING: SERDAL ALTUN SCRIPTWRITER: ABDURRAHİM KARABULUT YUSUF AYDOĞDU STORY: İMRE FARUK
ERDOĞZ ART DIRECTOR: ABDURRAHİM KARABULUT MAHSUN CELAYİR SAĞIR HÜSEYİN DEMİRTAŞ MUHAMMED CELAYİR SOUND: AHMET CİDER
SET SUPERVISOR: KADİR İŞLEK EFFECT: İSMET KALE HALIT NUR TARTAN SOUND DESIGN: SERDAL ALTUN BEHIND THE CAMERA: MAKE UP:
MUHAMMED CELAYİR MUSIC: GÜLŞEVİN MEDAR - LORİ LOŞİ ÇÜVEN MÜZİK PRODÜKSİYON ELİYÉ HEMED - KELEŞO CEVAHİR ÇOKBİLİR
POSTER: ERCAN ALTUNTAŞ

13.11.2024

Pêşandana kurtefîlmê û hevpeyvîn: belgefîlma «Distan» a derhêner Abdurrahman Karabulut li Baroya Wanê hat nîşandan.

14.12.2024

Konsera Mehmet Atlı li Salona Konferansê ya Tahir Elçî ya Baroya Wanê pêk hat. Bername wekî beşek ji xebatên me yê çandî, ji bo bikaranîna zimanê Kurdî di jiyana giştî de hat lidarxistin.



MEHMET ATLI

VAN / İpekyolu

Van Barosu Tahir Elçi Konferans Salonu

Ali Paşa Mah. Baro Sok. No:20
İpekyolu/Van

14 ARALIK 2024 CUMARTESİ 20:00



2024

Şanoya «Çıkûş» bi hevkarîya Şaredariya Mezin a Wanê û bê heq ji şanohezan re hat pêşkêşkirin. Lîstika ku bi Kurdî hat pêşkêşkirin, ji bo pêşxistina şanoya Kurdî û berfirehkirina temaşevanan hat piştgirîkirin.

23.02.2025

Me bi mêvanên xwe re filma «Gênc» temaşê kir; hevpeyvînek têr û tijî bû. Em ji derhêner Alî Kemal Çınar re spas dikin.



11.05.2025

Li ser pîrozbahiya 15ê Gulanê lîstika «Ji Kêla Dimdimê» hat lîstin. Em ji lîstikvanên Şanesînê û şanohezên xwe re spas dikin.






28.09.2025

«Fitbol bi Kurdî xweş e!» Pêşiya derbiya Kurdan Van Spor & Amed Sporê, gotûbêjek bi şîroveyên Kurdî yên Ali Fikrî Işık pêk hat.

Çîroka Dengbêjekî Mihemedê Beyro

Derhêner
Ronî Nasir Kaya



Kîngê ku dengbêjekî guhdar bikim,
dikevim nav xewn û xeyalên
zarokatiyê. Şevên
Serhedê yê zivistanê ye reş e dirêj
mîn hildidin dibin.
Em bi stranan, bi wan peyvên
efsûnî sermest dibûn...




VAN BAROSU
KÜLTÜR - SANAT KOMİSYON
KÜRTÇE DİL KOMİSYONU



YÖNETMEN
RONÎ NASIR KAYA

BELGESEL GÖSTERİMİ
&
İMZA / SÖYLEŞİ

MODERATÖR
AV. BİNYAMİN AĞLAMİŞ

18 EKİM 2025
CUMARTESİ / SAAT 18:30

VAN BAROSU YILMAZ GÜNEY
SİNEMA SALONU

İLETİŞİM
AV. ERDAL TEMİZALTIN
0544 306 82 35





17.10.2025

Belgefîlma «Çîroka Dengbêjekî – Mihemedê Beyro» ya derhêner Ronî Nasir Kaya hat nîşandan û hevpeyvîn hat kirin.



11.2025

Gotûbêja «Terenumên Kurdî» bi beşdariya mêvanên qedirbilind pêk hat; bernameyeke têr û tijî bû. Di bernameyê de li ser kevneşopiya terenumên Kurdî û cihê wê di çanda devkî de hat axaftin.




05.12.2025

Gotûbêj û îmze bi nivîskar Îhsan Colemanî re li Eywana Tahir Elçî ya Baroya Wanê pêk hat. Li ser berhemên nivîskar û girîngiya nivîsandina bi zimanê dayîkê hat sekinandin; piştî gotûbêjê merasîma îmzeyê pêk hat.




20.02.2026

Me bi mêvanên xwe re belgefilma «Kirasê ji Agir – Xalid Begê Cibirî» temaşê kir. Em ji derhêner Keremo û pêşkêşvan PRZ. Ozan Başdîncî.



11.05.2026

Bernameya «Hawar – Çîroka Hawarê» bi lêhêner û lîstikvan Ayhan Erkmen pêk hat; me bernameya xwe bi kêf û coş qedand.



20.05.2026

Gotûbêja «Yêrevan Xeber Dide» li ser serpêhatiya Radyoya Yêrevanê û rojnameya Rya Teze, bi beşdariya Tîtalê Keremê Seyad, Salih Kevirbirî û Pr. Sîpan Gökhan pêk hat.



25.06.2026

Belgefîlma «Dengê Vê Axê – Kazo» ya derhêner Keremo hat nîşandan. Em ji hunermend Kazo, derhêner Keremo û beşdarên xwe re spas dikin.





09.2026

Em beşdarî promiyera lîstika «Destana Zembîlfiroş» a ku ji aliyê ŞanoWanê ve hatibû amadekirin bûn. Şanoyeke serkeftî û bi tîr xwe tije huner bû.

XEBATA FERHENGHA TERMÊN HIQÛQÎ

Komxebata termên hiqûqî yên Kurdî



09-10.03.2025

Di çarçoveya Komxebata Termên Hiqûqî yên Kurdî de civîna mezin a 4em li Mêrdînê pêk hat. Em li ser navê komîsyona xwe beşdar bûn; spas ji bo mazûvaniya Baroya Mêrdînê û piştgiriya Weqfa Mezopotamyayê.



16.11.2025

Di berdewamiya xebata Ferhenga Termên Hiqûqî de em beşdarî civîna Batmanê bûn. Spas ji bo mazûvaniya Baroya Batmanê û piştgiriya Weqfa Mezopotamyayê.



BÎRANÎN Û ROJÊN TAYBET

Bibîranîna zimanzan, nivîskar û rojnamegerên Kurd



Zimannas û lêkolînerê Gelê Kurd
Mehmet Emin Bozarslan çûye ser dilovaniya xwe.
Serê malbatê û Gelê Kurd sax be.



11.02.2026

Zimannas û lêkolînerê gelê Kurd
Mehmet Emin Bozarslan çû ser
dilovaniya xwe. Serê malbatê û
gelê Kurd sax be.

10.03.2026

Helbestvan Ehmed Huseynî çû ser
dilovaniya xwe. Serê malbatê û
gelê Kurd sax be. Helbestên wî yên
bi Kurdî cihekî taybet di wêjeya me
ya hevçerx de digirin.



Helbestvan Ehmed Huseynî çûye ser dilovaniya xwe.
Serê malbatê û Gelê Kurd sax be.





22.04.2026

22ê Nîsanê Roja Rojnamegeriya Kurdî: tekoşîna ji bo rastî û ziman. Me hewldanên hemû xebatkarên çapemeniya Kurdî bi rêz silav kirin.

15.07.2026

Em nemir Celadet Elî Bedirxan bi rêzdarî bi bîr tînin. Bi weşandina kovara Hawarê û xebatên xwe yê rêzimanî, wî bingehe nivîsandina Kurdî ya bi tîpên Latînî danî.

